| qûm: >>bnr dewkil                                          |                                                                  |                                                                                              |                                                                                           |
| qumbere kirin; dînamît kirin                               | dinamitlemek                                                     | dynamiter                                                                                    | to dynamite                                                                               |
| qurşe; kurşe, kuşre                                        | üzerine bastığında batmayan, donmuş kar                          | neige durcie, gelée                                                                          | hard-crusteD snow                                                                         |
| reşreşk; reşreşik                                          | tahıl içindeki küçük, yuvarlak, siyah tanecik                    | nigelle                                                                                      | a small round black seed or speck in wheat                                                |

# Hindek peyv ji Behdînan

Amadekar: Fazil OMER

| kurdî                             | tirkî                                   | fransizî                                       | îngilîzî                                         |
|-----------------------------------|-----------------------------------------|------------------------------------------------|--------------------------------------------------|
| şîpre: >>bnr birîngeh             |                                         |                                                |                                                  |
| berûbezîkanê: berîkanê            | koşu yarışı                             | course, concours de vitesse                    | a race; a running race                           |
| pilt; pelt                        | dolgun ve hantal                        | grassouillet                                   | plump and sluggish                               |
| pilît kirin; pil kirin, qut kirin | koparmak                                | arracher                                       | to cut off, to sever, to amputate                |
| pûdan: >>bnr perixandin           |                                         |                                                |                                                  |
| pêşo; meşin: >>bnr misîn          |                                         |                                                |                                                  |
| tivikîn                           | hızlı gitmek                            | aller vite                                     | to move quickly, to speed, to rush by            |
| tilotank: >>bnr tilove            |                                         |                                                |                                                  |
| tilmisk: >>bnr qutif              |                                         |                                                |                                                  |
| tilîkêş; tilîbijêr: >>bnr cûr     |                                         |                                                |                                                  |
| tîjav; zirik                      | kül suyu                                | eau cendrée utilisée comme lessive             | lye                                              |
| porçik; çix: >>bnr tûncik         |                                         |                                                |                                                  |
| cel; çelake                       | ceviz ağacını silkmede kullanılan sırık | gaule                                          | a pole used to shake nuts from a tree            |
| celweşîn, celevan                 | ceviz ağacını sırıkla silkeleyen        | préposé à faire tomber des noix avec une gaule | a person who knocks nuts from a tree with a pole |
| ça                                | küçük bir girdap                        | petite gouffre d’eau, petit tourbillon d’eau   | a small whirlpool, an eddy                       |

|                                                                                                |                          |                                     |                                |
|------------------------------------------------------------------------------------------------|--------------------------|-------------------------------------|--------------------------------|
| hêşîlme <span></span> yardan kirin                                                             | vurup yere sermek        | frapper et mettre à terre quelqu’un | to knock someone to the ground |
| daqurçok                                                                                       | yutumluk, yutmuk         | gorgée                              | a mouthful, a gulp             |
| dûçik; zîlk: >> bnr dirêşûşk                                                                   |                          |                                     |                                |
| dirêşûnk                                                                                       | sürüngenlerin dili       | langue fourchée des reptiles        | forked tongue                  |
| dexş; zixt                                                                                     | bizlengiç                | aiguillon (pour bovins)             | ox goad                        |
| dendeloşk: kengiroşk, kengirok                                                                 | kenger tohumu            | graine de chardon                   | thistle seeds                  |
| rahole: >>bnr sist û pist                                                                      |                          |                                     |                                |
| zixzixandin; zixt dan: >> bnr fît dan                                                          |                          |                                     |                                |
| sempilosk; qulîpank, qelepîçk, qulpanî: >>bnr qulîpaçik                                        |                          |                                     |                                |
| şaroxe; şaloxe; şîrox, şiloxe, şiloxe, şirox, şimbên                                           | ayakkabı veya çorap bağı | lacet                               | a shoe or stocking lace        |
| şevaroj; şevero, şevrûj, şeveroj                                                               | gece gündüz, sürekli     | jour et nuit, constamment           | day and night, continually     |
| kujîj; qijûjk: >>bnr qurmîçk                                                                   |                          |                                     |                                |
| girrdîl; «ecelok; pêçînk; pêçonk, encîl, encîlok, silêlank, selîlank: >>bnr girgirok, gargarok |                          |                                     |                                |
| majê; mojê: >>bnr majo                                                                         |                          |                                     |                                |
| mîlxe                                                                                          | ağaçtan manivela         | manivelle en bois                   | wooden lever                   |
| lahêze: >>bnr lihaze                                                                           |                          |                                     |                                |
| meyav; teyaz: >>bnr tenik (av)                                                                 |                          |                                     |                                |
| nawirte, şimate, qerebalix <span> </span> : >> bnr qalmeqalm                                   |                          |                                     |                                |
| nîfî: >>bnr pizî                                                                               |                          |                                     |                                |
| herzal; hizêl, herzêlk: >>bnr evzêl                                                            |                          |                                     |                                |

# Xwarinên devera Behdînan (II)

**Amadekar: Îsmâîl ŞAHÎN**

**hêkerûn**

hêkrûn [Zaxo]; hêlikerûn [Akrê]. (xwarin) hêk, ya ku bo xwarinê di ber rûnî de diête sor kirin û biraştin.

**hêlepep**

hêlepep. (xwarin) ar û hêk, yên ku di nav yek de û wekî hêkerûnê di ber rûnî de diêne sor kirin û qelandin.

**heriftok**

ji belgmêw û birinc û xwê û rûnî pêk hatîye. Belgmêw diêne hûr kirin û di nav rûnî de diêne qelandin û paşê av bi ser birincî de diête berdan û li ser agirekî ne gur diête danan heta ku hişk dibit û berhev dibit bo xwarinê.

**herûşk**

hêvrîşk [Zaxo]; hermîşk [sûrçî]; hevroşk [goyî] dorik (nanê sêlê yê piçûk) ya ku kel û nûpatî, ewa bo xwarinê, di nav nîvişkê sorkirî de diête hûr kirin.

**hewdel**

girara tepilî (tepole, zeloqî) ya hûrkê danhêrkî, ya di ber av û rûnî de diête kelandin. Li hindek cihan pelûk/awar, ya ku ji arê genimî yan jî garisî (=gilgil), yê ku di ber av û rûnî de diête têkvedan û kelandin.

**hûrik/ «ûrik**

hûrkê/’ûrkê (kîbe) kewalî, yê ku diête parçeparçe kirin û wekî dolmeyan bi têkilê birinc û qîmeyî diête dagirtin û dirûtin û kelandn.

**îprax/ pirax**

(= pelê rezan, pelên pêçayî). Belgên mêwan û yan bersilkan, yên ku di ava germ de hatîne zerkirin/nermkirin û nîva wan bi birincî û qîmeyî hatîye dagirtin û hatîne werpêçan û kelandin.

**jajerûn**

Vedvedoka jajî, vedvedok (=pelûr). Jajîyê ku di ber rûnî de sorkirî û qelandî.

**jajî**

Şorî [gergerî]. Xwarina ku ji têklê penîrî û givirkan (=topik) û hindek giyayên xwarinê pêk diêt. Jajî mudehekê sernişiv di cerkan de diête binax kirin û piştî înanederê wek xwarin diête bi kar înan. (Di çêkirina jajî de) piştî dagirtina cerkê jajî, piçeka xwê bi serderê cerkî diête werkirin. Serder bi hindek belgên mêwan û paşê bi pateyekê diête nixaftin. Ew pate (paç) bi gewrîya cerkî ve diête girê dan û kasêlkek (=qafik) li ser pateyî diête danan. Ji nû derê cerkî diête hinûn (=sîwax kirin/ seyandin) û paşê diête binax kirin.

**kade**

Kulîçe. Hevîrê ku dubarî bi awayekî sêgoşek diête çêkirin û navzikê wî ji gûza hindê/xurmeyê/kunciyê diête dagirtin. Lêvên wî kezîkî diêne veçemandin û

rûyê wî bi ser ve bi hêkê diête rûkêş kirin û bi nexşekî taybet diête nîşan kirin û di firneyê de diête biraştin.

**kadeya quradê**

Kadeya mezin ya ku navzikê wê tejî qurad e û di rûnî de diête qelandin.

**kadeya penîrî**

Kadeya mezin ya ku navzikê wê tejî penîr û di rûnî de diête qelandin û sor kirin.

**kadesûrk**

Kadeya mezin ya navzikê wê ji jajî û penîrî diête dagirtin û li ser sêlê diête biraştin. Hevîr diête pan kirin û jajî li ser rexekî wî diête belav kirin û rexê dî bi ser de diête dadan. Lêvên wî bi tilan diêne veçemandin û li ser sêlê diête biraştin.

**karîbirinc**

Karîya diête zer kirin û di ber rûnî de diête kelandin, paşê birinc di nav diête vedan û kelandin û berhev dibit bo xwarinê.

**karîtirşk**

Karîya hişk ya ku diête zer kirin û di ava simaqê û tehînê de diête xesandin (kuştina jehra karîyê di simaq û tehînê de) û kelandn.

**karîkutilk**

Karî ya ku diête zer kirin û xesandin û kutilk li ber diêne kelandin.

**kebab**

Goştê qîmekirî û hevîrkirî yê ku bi şîşkê ve diête biraştin.

**keçelok**

Girar (savar/birinc) ya ku bi nîsk.

**keledoş**

Nanê gerim di nav dewê keşkan de diête hûr kirin û kuncî/kakilgûzên qutayî bi ser de diêne werkirin. Careka dî dew bi ser de diête kirin, hosa çend tayek li ser êk diêne çêkirin û rûnê meşkê yê sorkirî di gel filîlan bi ser de diête berdan û bo xwarinê berhev dibit.

**kelînok**

Kelîsûrk [gulî]. Nok in hêj şîn, ji kelîkan (=qalik) diêne derêxistin û qelandn.

**keşkerûn**

Keşk in (pirtûmirtên wan in) yên ku piştî hisûn û bişaftinê di nav rûnî de diêne sor kirin û qîşqilandin (=qelandin) û bi nanî diêne xwarin.

**kulindmast**

Xwarin, ya ku pêk dihêt ji tîfş (=tûjî, qetek) û teqalkên (tûjîyên girover) kulindkoseyî (=rextik, xirtik, dolmik) û sîra hûrkirî û mastî. Teqalkên kulindî di nav rûnî de

diêne qelandin û sîr diête hûr kirin û têkde di nav mastî de diêne vedan.

**kulor**

Spila dewî (=dewê tîr) ya ku kutilhûrk têde ne û danhêrk/savar/birinc li ber e. Li hindek cihan kutilka birincî û kakilbahîvan ya ku di nav dewî de diête kelandin.

**kizik**

Çizîlk [Şingal]. Parçeyên hûrên bezî yên ku piştî hûrkirin û helandina dûngê (dûv) pezî bo rûnî û li ser agirî, nehelayî dimînin û di nav rûnê bezî de sor dibin û dikuzirin û bo afika kutilkan (di ber pîvazê de) û bo kadesûrkan û bo ser giraran diêne qelandin û carna bi nanî jî diêne xwarin.

**kundik**

[Amêdî]. Birinca bi kundik (kundir, kulindir). birincê hûrkirî û qîme di nav vedayî û têkilkrî û hevîrkirî yê ku wek hulolokan (=gulolîk, hilolîk) lê diête kirin. Di gel hestî û bacanreşk û nokan - hindek caran di gel êk ji wan - di nav avê de diête kelandn. Li hindek cihan kulindê zer yê ku wek zelatê hûrkirî û birinc li ser e.

**kundika bikutilk**

[Amêdî]. kutilka ku di nav kulindkoseyê hûrkrî de diête kelandin.

**kutildewk**

Kutilka ku di nav dewê borandî (=dewê zêde kelandî) de diête lênan.

**kutilhelebî**

Kutilka Helebê; kutilka mêrdînî [Zaxo]. Kutilka birincî, ya ku ji hevîrê birincê kelandî diête xir (=kom) kirin. Nîva wê bi têkilê pîvaza qelandî û kerafsê (=kerevîz) û qîmeyî diête dagirtin. Hêk di rûyê wê diête dan û di rûnî de diête sor kirin û qelandin.

**kutilhişk**

Kutilka bê navik ya ku çu di nîva wê de nîne.

**kutilhûrk**

Kutilka biçûk û xir (=girover) û bê navik ya ku di nav karîyê û ava simaqê de diête kelandin.

**kutilk**

Kiftik [Akrê]. kutilka ku ji hevîrê hûrik yê danhêrkî diête çêkirin û nîva wê bi arxafkê/qîmeyî diête dagirtin û di ber afika bersilkan de diête kelandin.

**meqlûb**

Goşt diête kelandin û birinca sor diête lênan. Pitat û bacansork û bacanreşk diêne qelandin û di qazanê de diêne rêz kirin, paşê birinca sor bi ser de diête berdan û

pêkve û di qazanê de li ser agirî diête danan heta digehit û berhev dibit bo xwarinê.

**meremût**

Bêmik (*Pistacia atlantica var. Kurdica*) û kezwan bi qalpoşk (=qalik) ve di hawinî yan jî di conî de diêne qutan û hêran. Piştî qutan û hêranê bi bergêrî (berekî wekî bagurdanî ye ji bo hûrkirinê li ser diête gêran), pêşçav wekî arxafkê lê diêne kirin. Wek xwarin bi nanî diête xwarin, belê ne wekî tehîna kuncîyan ron e, belku jê hişkîr e. Hindek piştî bêjîngkirinê, di nav doşavê de hevîr dikin, yan doşavê berdidine nav, da pê bisitirit û çir bibit. Hindek jî ji bo zêdexweşkirinê doşavê û hingivînî û mewîjan di nav vedidin. Xwarineke zêde hinavnermker e.

**mergeşîr**

[mîranî]. Şîr diête gerim kirin û xwê û rûn di nav diête vedan û nan diête hûr kirin. Paşê ew şîr bi ser de diête berdan û bo xwarinê berhev dibit.

**misaqe**

Bacansork û hêkên ku wek xwarin di nav yek de diêne kelandin.

**mizewk**

[Berwarî jorî - Hiror]. Tirşîka afka wê spî ya ku giyayê biharê (karîyê, sêbiskê, pêgurgê) û pûngî û simaqê dikinê.

**nandoşavk**

Nanê doşavkirî yê ku doşav di rûyê wî diête dan.

**nanik**

Kêk. Nanhindok [Akrê]; nahindok [sûrçî]. Şirînahî ya ku li ser gelek form û fesal û awayan, ji hevîrî, şekir, hêk

û rûnî diête çêkirin.

**nansêlk**

Nasêlk [doskî jorî, herkî]; navsêlk [sûrçî]. Dorika ku sertû li rûyê wê diête dan û naneke dî li ser diête danan (bi ser de diête girtin) û li ser sêlê diête biraştin û sor kirin. Piştî ji ser sêlê diête rakirin, lêvên wê wekî yên naskenanê li ser êk diêne pêçan û ji nû diête xwarin.

**nantehînk**

Nanê tehînkirî, yê ku tehîn di rûyê wî diête dan û şekir pê diête werkirin û li ser êk diête tewandin. Şivan, darî (=êzingvan), nêçîrvan û balavî (=beravî) di gel xwe dibine çolê.

**naskenan**

Hevîrê ku wekî nanî diête pan kirin û her çar kujî bi awayekî nivîştokî bi ser êk de diêne înan. Di nav rûnî de diête sor kirin û biraştin. Li nav Nêrwerêkan hevîr bi şîrî diête hevîr kirin, paşê bi awayê sewikan diête pan kirin. Rûn di rûyan diête dan û li ser sêlê diête sor kirin û qelandin.

**nihkav**

Nanê tenik, yê ku di rûnî de diête qelandin û hûrhûr dikine di amaneke de û doşav (=mot, dims) bi ser de diête werkirin.

**nirre**

Girara ku dira/xirûbî (*sorghum*) yê qutayî di nav de diête hilkirin, piştî wekî birincî diête kelandin.

**pelav**

Birincê kelandî yê sade.

**pelavbirinc**

Pelavnîsk. Birinca binîsk, birinc û nîsk, yên ku di nav êk

de diêne kelandin û lênan. 2. Maşbirinc. Maşa kelandî, ya ku birinc di nav diête vedan û hilkirin.

**pelavmaş**

Birinca kelandî ya bimaş/birinc û maş, yên ku di nav êk de diêne kelandin. Maş di avê de diêne kelandin (kelek diête maşan) û paşê birinc û rûn di nav diêne vedan.

**pelavsilk**

Şêxsilk; tirxîna (=tarxûn) bisilk (=silkesork). Girara birincî ya silk li ber.

**pelûkulindik**

Pelûqundik [herkî]; pelîqundik [rêkanî]; sirkulind. Kulindzer diête hûr kirin û zer kirin. Li ser agirî û di ber rûnî û pîvazê de di hemdê xwe de diête qelandin û kelandin û mirîçandin (perçiqandin), heta wekî xwarina tepilî lê diêt û bo xwarinê diête pêşkêş kirin.

**pelûşîr**

Xwarina ku têde şîr û ar di nav êk de diête kelandin û piştî berhevkirinê wekî mastî pêşçav dibit û wek têşt bi nanî diête xwarin. Dubarî ji wî şîrî diête çê kirin, yê hêşta bi duristî ji zakînyê (=xîçnî) bi dûmahî nehatîye û bi kêrî meyardinê naêt.

**pelûsork**

Xwarina ku ji doşav û arê xav û avê diête berhev kirin. Doşav û arê xav têkilî yek dikin û baş têkve didin û avê dikine (berdidine) nav û gerim dikin û dixwin. Berê gelek caran ev xwarine ji berê şivan û nêçîrvanan ve dihate hişk kirin û hilgirtin: Demê hewce dibûne xwarina wê, bi av lê reşandinê nerm dikirin û dixwarin.



Bêmik,kizwan, şînok, menengûş  
Lat: *Pistacia atlantica var. Kurdica*  
Tr: menengiç  
Eng: wild pistachio



Dira, xirûbî  
Lat: *sorghum*  
Tr: sorgum darısı  
Eng: sorghum

# Hindek toponîmên kurdî - II –

Amadekar: Fadil OMER

| kurdî                                      | tirkî                                   | fransizî                       | îngilizî                              |
|--------------------------------------------|-----------------------------------------|--------------------------------|---------------------------------------|
| cê: cih, cî, cîh                           | yer                                     | lien, place                    | place, area                           |
| cebilixane, cebirxane                      | cephane                                 | arsenal                        | arsenal                               |
| cehnem: dojah                              | cehennem                                | enfer                          | hell                                  |
| cemelon: avahiyeke nijyar asin û tûtya     | bungalow                                | bungalow                       | bungalow                              |
| cî; cîh□ geo-: navekî giştî ye bo erdan    | yer                                     | lieu, place                    | place                                 |
| cîh, cî: navek giştî ye bo erdê taybet     | yer                                     | place                          | place                                 |
| cinîk: baxçe, bîstanê sêv û hirmîk û bîhan | meyve bostanı                           | petit verger                   | fruit garden                          |
| cirin; cirne; cirnî, curn, kurn            | kurna                                   | cuve, bassine                  | basin of stone                        |
| co; cok, cihok, herq                       | kanalcik, kanalet                       | rigole, petit canal            | rill                                  |
| comik                                      | yarık                                   | fissure, fente                 | rift, cleft                           |
| coxîn: bêder                               | harman                                  | aire de battage                | threshing floor                       |
| çadir: kûn, kon, xîvet                     | çadır                                   | tente                          | tent                                  |
| çal                                        | çukur                                   | fosse, trou, cavité            | hole, pit                             |
| çalik                                      | çukurcuk                                | petite fosse                   | a small pit                           |
| çapxane (n)                                | matbaa                                  | imprimerie                     | printing house                        |
| çarriyan, çaryan                           | dört Yol                                | carrefour                      | crossroads                            |
| çavîk, çavî                                | göze, göz, kaynak                       | point d’eau, petite source     | outlet, spring                        |
| çayêr, çayîr, çawîr                        | çayır                                   | prairie                        | pasture                               |
| çayxane (n)                                | çayhane                                 | salon de thé                   | teahouse                              |
| çel û çiya, çil û çiya                     | dağlık alan                             | zone montagneuse               | mountainous area                      |
| çem                                        | 1. robar: ırmak 2. berçem: ırmak kenarı | 1. rivière, 2. rive de rivière | 1. river, 2. riverbank                |
| çeper                                      | çeper, siper                            | retranchement, fortin          | barricade, fence                      |
| çerwane, çêregeh                           | otlak                                   | prairie gardée                 | guarded pasture                       |
| çiya                                       | dağ                                     | montagne                       | mountain                              |
| çilxane, çilexane:                         | çilehane                                | hermitage                      | hermitage                             |
| çol, çoleme, çolistan                      | ekilmemiş arazi                         | terre non cultivée             | uncultivated land                     |
| -dan; -dank                                | yer gösteren son ekler                  | suffixe de lieu                | suffix marking place                  |
| daristan                                   | orman                                   | foret, bois                    | forest                                |
| daverist                                   | varangel                                | pont suspendu en cordage       | simple suspension bridge, rope bridge |
| dehl                                       | koruluk                                 | bosquet                        | woods                                 |
| dêm, erdê bejî                             | susuz arazi                             | terre non cultivée             | non irrigated field                   |

# Hin peyvên kêmnas – nenas (XIX)

Amadekar: Reşo ZÎLAN

| kurdî                                                           | tirkî                                             | fransizî                                                           | îngilizî                                                     |
|-----------------------------------------------------------------|---------------------------------------------------|--------------------------------------------------------------------|--------------------------------------------------------------|
| xwe kokandin: >>xwe kok kirin                                   |                                                   |                                                                    |                                                              |
| fêrşanî: <bi rûyê wê yê spî yê fêrşanî>                         | oval                                              | ovale                                                              | oval                                                         |
| bincilk                                                         | iç çamaşırı                                       | sous-vêtement                                                      | underwear, under garments                                    |
| filîte: >>bnr tertere                                           |                                                   |                                                                    |                                                              |
| heyn                                                            | esna                                              | moment                                                             | time, period, era                                            |
| qiricandin; qırçandin, qiriçandin, qırqıçandin                  | şaklatmak (sakızı), dişlerini gıcırdatmak         | claquer (en machant de chewing gum)                                | to crack (one’s chewing gum), grind (one’s teeth)            |
| lolicîn; lolijîn, lolibîn: <li vî alîyî û li wî alîyî dilolici> | sallanmak                                         | se balancer                                                        | to rock, sway (from side to side)                            |
| biçikîn: >>bnr piçiqîn                                          |                                                   |                                                                    |                                                              |
| tilor: >>bnr tilmeqûn                                           |                                                   |                                                                    |                                                              |
| tewişîn: >>bn lolijîn                                           |                                                   |                                                                    |                                                              |
| çimirandin: <li stûyê wî siwar dibû û ew diçimirand>            | basıp ezmek                                       | piétiner, presser                                                  | to press down on                                             |
| buxz: <kîn û buxz>                                              | kin                                               | kîn                                                                | hatred                                                       |
| çaqrût; çaqtazî: >>bnr çîprût                                   |                                                   |                                                                    |                                                              |
| kelp; kelb, kûçik, kûtî, seg: >>bnr se                          |                                                   |                                                                    |                                                              |
| pancik                                                          | paça                                              | bas d’un vêtement                                                  | lowest part of trouser leg                                   |
| gulbend: <bêhna kulîlk û gulbendan>                             | çelenk                                            | guirlande de fleurs                                                | wreath, garland                                              |
| hilciqandin: >>bnr merçiçandin                                  |                                                   |                                                                    |                                                              |
| qisedan:                                                        | sohbet                                            | conversation, causerie                                             | conversation, talk, chat                                     |
| <tu ketîyî qisedan û galegalên derewîn>                         |                                                   |                                                                    |                                                              |
| tevgirî: >>bnr kelegirî                                         |                                                   |                                                                    |                                                              |
| rojnig: >>bnr rojin                                             |                                                   |                                                                    |                                                              |
| gerze: >>bnr geraze                                             |                                                   |                                                                    |                                                              |
| vilîn: >>bnr livîn                                              |                                                   |                                                                    |                                                              |
| arde: <destên xwe dabûn ser hesinê ardeya şaneşînê>             | korkuluk                                          | rambarde, balustrade                                               | railing, banister                                            |
| lê ferqilî: >>bnr lê varqilîn                                   |                                                   |                                                                    |                                                              |
| temelîg: >>bnr temborî                                          |                                                   |                                                                    |                                                              |
| êş û araz: >>bnr êş û azar                                      |                                                   |                                                                    |                                                              |
| wersele; wersel, wesle, wesele, wesel                           | 1. parmak eklemi 2. kas 3. parça                  | 1. jointure, articulation (de doigt etc.), 2. muscle, 3. partie    | 1. joint (of finger, etc.), 2. muscle, 3. piece, part        |
| tevligirî; kizgirî: >>bnr kelogirî                              |                                                   |                                                                    |                                                              |
| kokelî hev bûn: >>bnr qoçandin                                  |                                                   |                                                                    |                                                              |
| xijonek: >>bnr şemitokî                                         |                                                   |                                                                    |                                                              |
| çileyê erbeîn                                                   | hazreti Hüseyin`in ölümünün kırkinci günü, erbain | cérémonie chiite marquant le 40e jour de la mort de l’imam Hussein | shiite ceremony observing 40 days after death of imam Husayn |
| fesilîn; ji hev veqetîn                                         | ayrışmak, dağılmak                                | se désagréger, se désarticuler                                     | to part company, be separated                                |
| tapêl; tapûl, tapol                                             | biçilmiş ot veya ekin öbeği                       | gerbe de céréales fauchés                                          | bundle or sheaf of harvested grass or crops                  |
| serko: >>bnr sergo                                              |                                                   |                                                                    |                                                              |
| kut: >>bnr kerî, perçe                                          |                                                   |                                                                    |                                                              |
| tipûteze, topteze, tipteze, tiptaze                             | taptaze                                           | tout frais                                                         | brand new                                                    |
| qeyran                                                          | kriz                                              | crise                                                              | crisis                                                       |
| kilmûç: >>bnr kilmîç                                            |                                                   |                                                                    |                                                              |
| ceridîn                                                         | cüret etmek                                       | oser                                                               | to dare                                                      |
| tef û tal: >>bnr kel û pel                                      |                                                   |                                                                    |                                                              |
| tişt û tewa; tişt û teba; tişt û teva                           | öteberi                                           | bricoles                                                           | things, stuff                                                |
| hêle û hêz                                                      | güç, takat                                        | force                                                              | strength, might                                              |
| mizmizandin: <di devê xwe de dimizmizand>                       | gevelemek                                         | marmonner                                                          | to mumble, mutter                                            |
| tewşokî: >>bnr tewşo-mewşo                                      |                                                   |                                                                    |                                                              |
| dexisîn                                                         | kışkanmak                                         | envier, être jaloux                                                | to envy, be jealous of                                       |
| dexisandin                                                      | kışkandırmak                                      | rendre jaloux                                                      | to make envious, make jealous                                |
| hoz: <hoza yekî birin>: >>bnr fer                               |                                                   |                                                                    |                                                              |
| beliqîn                                                         | pörtlemek                                         | saillir, être protubérant                                          | to bulge (eyes)                                              |
| ziq bûn: <di şûna xwe de ziq bûbûn>                             | donakalmak                                        | se figer, se fixer                                                 | to freeze in one’s tracks                                    |
| kortika stû                                                     | ense çukuru                                       | creux de la nuque                                                  | nape of the neck                                             |
| qevaz dan: >>bnr qevastin                                       |                                                   |                                                                    |                                                              |
| çindik dan xwe                                                  | hoplamak                                          | sautiller                                                          | to hop, leap                                                 |
| lix: <di nav av û lixa sar de digevizî>                         | mil, ince kum                                     | sable fin                                                          | silt, fine sand                                              |

## KURMANCÎ

MAGAZINE LINGUISTIQUE KURDE, supplément du Bulletin de liaison et d’information  
© INSTITUT KURDE DE PARIS, 106, rue La Fayette, 75010 Paris - France, Tel. : 00 33 (0)1 48 24 64 64, www.fikp.org  
Directeur de la publication : Reşo ZÎLAN, Réalisation : M. HASSAN